# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 943 20-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî

+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني


# Dara keçikê ya li çiyayê Kizwanan

**Meryem El-Hesen ya ji gundê Xera yê çiyayê Kizwanan behsa çîroka dareke li çiyayê Kizwanan ya bi navê "Dara keçikê" ku li kêleka wê kaniyek der bûye kir û wiha axivî: "Temenê dara keçikê nayê zanîn lê ji serdema Cihûyan ve heye. Tê gotin Cihû dixwazin keçikê bigirin, lê keçik ji Xwedê dixwaze wê bike darek da negirin.**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek deverên dîrokî hene ku rêwî lê disekinin her wiha gelek çîrokên veşartî hene li benda keşifkirinê ne. Çiyayê Kizwanan yek ji çiyayên herêma Cizîrê ye ku 35 km. dikeve başûrê rojavayê bajarê Hesekê. Li çiyayê Kizwanan gelek deverên dîrokî ku ji gelek rêwî û xelkên herêma Cizîrê re bûye cihê bêhnvedanê hene, yek jê Keleha Sukera û Mexlûca ye. Her wiha li çiya gelek kaniyên avê hene ku mirov û lawir jê sûdê digrin. Xelikê çiya bi xwedîkirina pez debara xwe dikin her wiha alternatîfa wesayîdan jî heye ew jî ker e. Her tepeyek serpêhatiyeke wî ya taybet heye. Lê li rojhilatê gundê Xera kaniyek heye ku dirêjahiya wê digihîje 4 metreyan û firehiya wê jî nêzî metreyek e, li kêleka wê kaniyê jî darek heye. Ev dar wekî hemû darên din li gorî her demsalê pelên wê diweşin û şîn tên. Pelên darê kesik in lê wekî darên din berhem nade. Di hemû daran de kizwan derdikevin, ango benîştê wê çêdibin û tên xwarin û bikaranîn. Lê ev dar berhem nade, tenê şîn tê. Navê vê darê "Dara Keçikê" ye, temenê wê jî nayê zanîn, ji ber ku ew şaxa ji darê bi erdê ve dirêj bûye dareke din jê derketiye lê li hev geriyaye. Lê heya niha nayê zanîn ku ev dar çend salî ye. Ji bo ku em bêtir serpêhatiya vê darê, cudahiya wê nas bikin her wiha ji aliyê şêniyan ve çawa tê parastin Meryem El-Hesen a 60 salî ji me re axivî.

Meryem El-Hesen di destpêka axaftina xwe de got ku şênî li çiyayê Kizwanan bi xwedîkirina pez debara xwe dikin û wiha domand: "Ev der wargeh, stargeh û warê min ê zaroktiyê ye. Em li vir debara xwe bi xwedîkirina pez dikin, ji ber ku li ser axa vê derê pembo û tiştên din çênabe. Gelek kanî li vir hene ku em avê jê dikşînin û lawirên me jê sûdê digrin."

**"Serpêhatiya "Dara Keçikê"**

Meryem El-Hesen da zanîn ku li Xerayê dareke ku ji hemû darên din cudahiya wê heye û wiha got: "Ne ji dema min, ji dema dapîr û bapîrên min de ev dar heye û dibêjin ku di binê vê darê de kaniyek heye. Min ji dapîrên xwe bihîst ku ji serdema Yahûdiyan de dema ku li çiyayê Kizwanan şer dikirin, ev dar ne dar bû lê belê keçik bû. Tê gotin ku keçikê ji Yezdan xwestiye wê bike dar da ku leşkerên Yahûdî wê negirin û destdirêjiyê lê nekin. Dengê wê çûye Xwedê û bi rastî jî bûye darek û li kêleka wê darê jî kaniyek çêbûye. Agahiyên berfireh li cem me tune ne, ji ber ku temenê vê darê pir dirêj e û ne ku min ji dapîra xwe girtiye, hîn dapîra min ji dapîrê dapîrên xwe girtiye û ji me re gotiye. Ji lewre bi derbasbûna salan re jî agahî kêm dibin û keseke ku ji wê serdemê mabe heya niha ku çîroka rast ji me re bêje, nemaye. Lê ya ku heya niha tê bîra me, ev dar di rastiya xwe de keçikek e."

**"Rêwî û mêvan serdana darê dikin"**

Meryem El-Hesen da xuyakirin ku şênî ji kaniya darê gelek sûdê digrin û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Dema ku şivan di ber kaniyê re derbas dibin, pez avê jê vedixwin her wiha gelek malbat jî avê jê dikşînin û pê baxçeyên ku zebzeyên payîzê û biharê li wan çêdibin av didin. Di heman wextê de jî gelek rêwî li gund disekinin serdana vê darê dikin. Her wiha gelek mêvanên ku di salên borî de ji gelek bajarên herêma Cizîrê, taybet dihatin serdana darê dikirin. Ji Sibatê de dihatin mêvantiyê heya destpêka gulanê. Mêvanên ku tên jî gelek tiştên xwarinê bi xwe re tînin û zarokên gund dilxweş dibin. Lê mixabin, ji ber rewşa şer êdî mêvan wekî berê nayên û bi taybetî di 6 salên derbasbûyî de pir kêm bûn."

**"Nexweşên ku xwe dispêrin vê darê, baş dibin"**

Meryem El-Hesen da payin ku dar wekî dara xweziyan e jî û wiha pêl da gotinên xwe: "Ev dar dara xweziyan e jî şênî, rêwî û mêvanên ku tên tayekî, rengê wê ne girîng e bi darê ve girê didin û li gorî niyeta dilê wan daxwazên wan pêk tên. Mesela, kesek nexweş hebe û tayekê bi darê ve girê bide ew nexweşiya wê/î diçe û baş dibe. Wekî ku dixwazin xwe ji hemû êş û nexweşiyan xilas bikin, xwe dispêrin vê darê. Ferq nîn e ku tayekî wê yê taybet hebe, dikare ji destmal û kirasê xwe jî qut bike û bi şaxekî darê ve girê bide."



**"Kesê şaxek darê yê ketî erdê jî rake teqez belayek tê serî"**

Meryem El-Hesen cudahiya vê darê ji darên din wiha bi bîr xist: "Pelê darê kesk in lê ev dar dareke bê berhem e, darên ku li çiya ne berhem didin û benîştê wan tê xwarin û cûtin. Her wiha kezwanê daran jî tên xwarin û ji qehwê re tên bikaranîn. Şaxê ku ji daran bikeve, em wekî qirşan wê dişewitînin. Lê ev dar ne wisa ye, ew şaxê biçûk ku ji darê dikevin jî em nikarin û newêrin bişewitînin ji ber ku dara ziyaretan e. Di demên berê de, yên ku jiyabin û li ser bûyerê hazir bûn ji hev re ev mesele gotibûn ku; carekê hinek mêvan tên, lê tiştekî li ser vê darê nizanin, şaxên darê yên li erdê ketine kom dikin û dibin. Berî ku ji gundê Xera derkevin, wesayîda wan diqulibe û dişewitin. Dayika min jî daxwaz ji min kiriye ku şaxeke biçûk jî ango darekî biçûk ji darê bikeve ez ranekim û neşewitînim loma ez dest nadimê. Ger ku em bişewitînin û rakin bibin malê jî muhtemelen dê belayek bi serê me de were. Şaxên ku hişk dibin û dikevin, kesek destên xwe dirêjî wan nake. Lê dema ku dar şîn tê, em di bin siya wê de bêhna xwe vedidin her wiha xwarina xwe li ber wê dixwin û ji kaniya wê jî avê vedixwin."

**"Li gorî ava kaniyê, em dizanin dê demsal çawa be"**

Meryem El-Hesen da zanîn ku ji miçiqîna kaniyê pê dizanin sal baş e an xirab e û wiha pêde çû: "Me berê ji kaniya wê av vedixwar, sala ku zivistan be ava kaniyê diherike û ber bi newalê ve diçe. Lê ev çend salên dawî êdî kanî bi xwe miçiqiye. Dema ku ava kaniyê kêm dibe, em pê dizanin ku demsal zuha ye. Îsal jî yekcar ava wê kêm bûye."

**"Divê wê biparêzin û lê baldar bin"**

Meryem El-Hesen bi vê gotinê dawî li axaftina xwe anî: "Ez vê darê gelekî diparêzim, nahêlim ku zarok keviran biavêje wê ango bi daran lêxin. Ji ber ku guneh e. Divê ku her kesa/ê serdana wê bike jî wê biparêze û baldar be destên xwe nedê."

***JINHA/SORGUL ŞÊXO***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| **Ambargo** (Fransî) | 1. Qedexekirina firotina malekî li welatekî. (yan ew bifiroşe, yan hin bifiroşinê) Astengkirin, rênedan. Gemaro, hîsar: Emerîka ambargo danî ser Îranê. 2. Astengkirina têkiliya weletekî bi dinyayê re. Gemaro, hîsar. 3. Astengkirina kesekî bi kesên din re. Gemaro, hîsar. |
| **Diyalog** (Fransî) | Axaftina dudu, yan çend kesan li pêşberî hev. Danûstandin. |
| **Festîval** (Fransî) | 1. Xwepêşandana pîşeyî: Festîvala filman hat lidarxistin. 2. Şahî: Ji bo pîrozkirina Newrozê festîvalak hat lidarxistin. 3. Xwepêşandana ji bo berhemeke binavûdeng ya herêmekê: Festîvala zebeşên Amedê. |
| **Komîn** (Fransî) | Komek ku bi hev re dixebite û hatina xwe par ve dike. |
| **Komîte** (Fransî) | Di asta jêr de çend kesên ji bo kirina karekî, yan meşandina wî, yan nûnertiya saziyekê hatîn erkdarkirin. Licne. |
| **Konser** (Fransî) | Stirangotina hunermendan li pêşberê civakê. |
| **Konsey** (Fransî) | Di asta herî jor de çend kesên ji bo kirina karekî, yan meşandina wî, yan nûnertiya saziyekê hatîn erkdarkirin. |
| **Mihrîcan** (Aryenî) | Festîval. Ereb jî bi kar tînin. |
| **Paradîgma** (Fransî) | 1. Mînak, model, nimûne. 2. Kombûna nirxan. 3. Li gorî hişmendiyekê hêman pîvan û rêgezên jiyana civakê: Rêveberiya Xweser dixwwaze li gorî paradîgmaya Neteweya Demokratîk pergalekê dayne. |
| **Pergal** | 1. Awa û şêweyê kirin û meşandina karekî. Sîstem, nîzam. 2. Amûr, alav. 3. Biserûberî, birêkûpêkî |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | P | A | T | A | ■ | K | Ê | ■ | Î |
| 2 | Z | ■ | E | R | D | E | L | A | N |
| 3 | ■ | M | ■ | T | O | L | ■ | N | ■ |
| 4 | S | I | B | Ê | ■ | A | L | F | A |
| 5 | I | R | ■ | Ş | E | M | Î | ■ | E |
| 6 | N | ■ | B | ■ | N | ■ | S | B | ■ |
| 7 | E | L | E | Z | Î | Z | ■ | Î | D |
| 8 | ■ | A | J | O | ■ | O | F | ■ | U |
| 9 | A | L | Î | ■ | A | M | E | T | A |

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 2 | | ■ | | ■ | | | | ■ | |
| 3 | | | | | | | | | ■ |
| 4 | ■ | | | ■ | | ■ | | | |
| 5 | | | ■ | | | | | | |
| 6 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 7 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 8 | | | | ■ | | | | | ■ |
| 9 | ■ | | | | | | ■ | | |

**ÇEP-RAST**

1. Bajarekî me… Tam, lezet
2. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wek sembola hêzê bi kar tînin
3. Bajarekî me
4. Dema mirov şîr bidoşe û dest nede tebaqeya bi ser dikeve, qeymax… Keriyê mî û bizinan
5. Jimara du, çar, şeş, heşt û hwd…. Paytexta Misrê
6. Rastêşek… Li Colemêrgê gotina 'yek'ê
7. Tûj… Dijberê rengî spî… Peyveke teşwîqkirinê
8. Sedemkarê tevgerê, paldêr… Têbînî
9. Bajarekî me… Pirç

**JOR-JÊR**

1. Kurteya elementa Aktînyûmê… Nexweşiyeke çerm e ku bi taybetî di gewde, çîm û rû de wekî kelepotkan derdikeve.
2. Kurtebêja otomobîlê… Boyaxa neynûkan
3. Di nava çûkên laşxur de çûkên hêrî zêde baskên wan mezin, qertel… Baneşana bêhntengiyê
4. Rengê reşê dibiriqe
5. Navê danseka brezîlyayiyan… Cephe, bere
6. Jimarek… Rengê ava deryayê û hewaya çîksayî
7. Meşa zarokan ya li ser dest û çokan
8. Heke… Wext, zeman
9. Daçekek… Di şanoyê de mêrê ku di dilqê jinê de derdikeve ser dikê

## Fikir û felsefeya Rêber Apo Komplo bêbandor kir

Ebdulkirîm Sarûxan: "Armanca wan ji Kompoya Navneteweyî misogerkirina tinekirina gelê Kurd û têkbirina tevgera azadiya kurdistanê bû, lê bi ser neketin." ***R-4***





# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 943 20-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## Jinên bi Rêber Apo re civiyayîn: Bingehê Rêbertiyê danî ti kes nikare hilweşîne

Jinên bi Rêber Abdullah Ocalan re civiyayîn diyar kirin ku tişta li ser bingehê demokrasî, wekhevî û edaletê hatî danîn hilweşandina wê ne hêsan e û gotin, eger hezar sal jî derbas bibin, tişta Rêbertiyê ava kirî hilnaweşe. Jinan da zanîn ku Rêbertî li hemberî her gef û êrişê banga yekîtiyê li gel dikir. ***R-2***



# TU BI ZIMANÊ XWE HEYÎ

Bi pêmana 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê, mamosteyên zimanê kurdî yên bajarê Qamişlo gotin, eger civak zimanê xwe winda bike, wê ew jî winda bibe. Lewra ziman hebûna gelan e. Mamosteyan herwiha ev roj li tevayiya gelan pîroz kir, bi taybetî li gelê Kurd. R-5




-ZIMAN BIÇE TI WATEYA TE NAMÎNE

-ZIMANÊ TE DÎROKA TE VEDIBÊJE

-XEZÎNEYA TE ZIMANÊ TE YE

-ZIMAN EMANET E, EMANET NAYÊ JIBÎRKIRIN

-ZIMAN NIRXÊ HERÎ PÎROZ YÊ CIVAKAN E

-MIRINA ZIMANEKÎ MIRINA GELEKÎ YE

-KU TU NEXWAZÎ WINDA BIBÎ, ZIMANÊ XWE FÊR BIBE FÊR BIKE

### 2 şehîdên Pêngava Gurzê Gelan li Dêrikê hatin veşartin



Bi hezaran şêniyên navçeya Dêrikê cenazeyên 2 şervanên QSD'ê Xebat Marînos û Serhed Harûn ku di Pêngava Gurzê Gelan de li bajarê Hesekê şehîd bûbûn, li Goristana Şehîd Xebat spartin axê. ***R-3***

### Dewleta tirkî ya dagîrker li Warxelê çekên Kîmiyayî bi kar anîn



Belge û dîmenên berxwedana li Warxelê û sûcên şer yên leşkerên dewleta tirkî ya dagîrker kirîn hatin weşandin. Ji wan belgeyan eşkere dibe ku artêşa Tirkiyê li Warxelê çekên Kîmiyayî bi kar anîne. ***R-3***

### Ji ber bihabûna venêrîna bijîşkan çûna dermanxaneyan zêde bûye



Ji ber bihabûna mafê venêrîna bijîşkan, herwiha ji ber ku piraniya xelkên herêmê aboriya wan lawaz e, gelek jê dema nexweş dikevin nikarin biçin bijîşk. Ji ber wê neçar dibin bê venêrîna bijîşk diçin dermanxaneyan û bi dermanan tedawiya xwe dikin. ***R-6***

### Xweparstina Cewherî li hemberî terora dewletê ye



Selah Şêxmûs: Hişmendiyeke xweparastinê ya xwe dispêre Neteweya Demokrtîk li bakur û rojhilatê Sûrî ava bûye. Wê bi nûjenbûna xwe li hemberî terora dewleta tirkî ya dagîrker, bibe çeka serkeftina gelan ya mayînde. ***R-5***


### Tecrîdkirina Rêber APO tecrîdkirina mirovayiyê ye



Ezher Ehmed: Hêzên desthilatdar û komploger, ji ber ku li hemberî berxwedan û têkoşîna Rêber APO bin ketin, bihêrs in û rêbertiya me di nava tecrîdeke giran de digirin. ***R-4***

# Jinên bi Rêber Apo re civiyayîn: Bingehê Rêbertiyê danî ti kes nikare hilweşîne

**Jinên bi Rêber Abdullah Ocalan re civiyayîn diyar kirin ku tişta li ser bingehê demokrasî, wekhevî û edaletê hatî danîn hilweşandina wî ne hêsan e û gotin, eger hezar sal jî derbas bibin, tişta Rêbertiyê ava kirî hilnaweşe. Jinan da zanîn ku Rêbertî li hemberî her gef û êrişê banga yekîtiyê li gel dikir.**









Jina bi navê Zelûx Ebdo (49), beşdarî civîneke girseyî bûye ku Rêber Abdullah Ocalan sala 1995`an li Kolna Nîl ya Helebê hatibû lidarxistin.
Zelûx Ebdo diyar kir di wê civînê de komployên dewletên mezin ên li dijî hemû tevgerên rizgariyê yên Kurdan, bi taybet komployên di serdema Serokwezîra dewleta Tirk Tansu Çîller de ku desthilatdariya wê di navbera (1993-1995) de dewam kir, hatin nîqaşkirin.
Zelûx Ebdo bi bîr xist ku rêbertî di wê civînê de banga hişyarî û çognedanîna ji fermandarên dewleta Tirk re da, serhildana li hember hemleyên serokwezîra dewleta Tirk û têkbirina planên wê kir.
9`ê Cotmeha 1998`an nîşaneyên yekemîn ên komploya navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan derketin holê ku hejmarek dewletên ewropî, herêmî û dewleta Tirk bi hevkariya PDK`ê tev lê bûn. Di encama vê komployê de rêber Ocalan neçar ma ku ji Rojhilata Navîn derkeve.
15`ê Sibata 1999`an rêber Abdullah Ocalan ji paytexta Kenya Naîrobî, hate revandin û radestî dewleta Tirk hate kirin. Ji ber vê yekê jî hêrseke gel berfireh çêbû. 15`ê Sibatê dîroka revandina rêber Ocalan bi roja reş di dîroka tevahî gelên azadîxwaz de tê naskirin.

**'BI HEVGIRTIN Û YEKITÎ HÊZÊN MEZIN WÊ TÊK BIÇIN'**

Di civîna ku Zelûx beşdarî wê bibû de, rêber Abdullah Ocalan pirsa çawaniya têkbirina dijmin û rêbazên ku planên dewleta Tirk ji bo tunekirina Tevgera Rizgariya Kurdistanê kir. Di wê demê de Zelûx wiha bersiva pirsa wî da: "Dema em yekitiya xwe ava bikin û her tiştê giran buha di oxira serxistina doza me de feda bikin, wê demê em ê plana dewleta Tirk têk bibin."
Rêber Ocalan ev yek teqez kir û wiha axivî: "Bi rastî jî heger em bibin yek, em ê li hember hemû astengiyan bi ser bikevin. Tu hêz nikare me têk bibe." Tevî ku demeke dirêj di ser wî civînê re derbas bûye, lê encamên wê heta niha li ser Zelûx û her kesê ku bi rêbertî re civiya ye, xuya dikin.
Têkildarî bandorên şoreşa rêber Abdullah Ocalan li gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Zelûx Ebdo destnîşan kir ku tunekirina DAIŞ`ê ku xetertirîn rêxistin e û têkbirina wê di êrişa dawî ya li ser girtîgeha Sînaa ya bajarê Hesekê de, bi saya serkeftinên rêber Ocalane ku banga hevgirtina hemû pêkhateyan, parastina destkeftiyan li hember çi êrişên li dijî projeya demokratîk, kir.
Girêdayî mijarê Zelûx Ebdo destnîşan kirin ku ji bilî şoreşa ku ji aliyê rêber Ocalan ve hate destpêkirin, hemû berxwedan û serhildanên li Kurdistanê negihiştin armancên xwe û wiha domand: "Berxwedana rêbertî bi revandina wî û girtina wî jî têk neçû, ji wê zêdetir hezkirina wî di nava gel de zêdetir bû, gelek kesan ji bo doza rizgariya gelan ku ji aliyê rêbertî ve hate pêşkêşkirin xwe feda kirin, gelek kes tev li hemleyên girava birçîbûnê bûn û gelek kesan çalakiyên fedayî pêk anîn û bi vê yekê nerazîbûn nîşanî komploya navneteweyî da".

**DU RÛYÊN HEMAN PEREYÎ NE**

Zelûx Ebdo wiha domand: "Dewleta Tirk birçiyê xwînê ye. Li ser kuştina gelê Kurd dijî. Hemû xwestekên wê ew e ku çawa Tevgera Azadiya Kurdistanê têk bibe. Lê rastiya me bi mirovahiyê tê naskirin. Em zilmê ji kesê re naxwazin û em ê li hember wê bisekine".
Komployên navneteweyî li dijî gelê Kurd ji destpêka revandina rêber Ocalan nasekinin. Zelûx Ebdo mînaka hovîtiya çeteyên DAIŞ`ê bi bîr xistin û got, sûcên wan mîna sûcên dewleta Tirk di salên 80`yî de ne û ev tişt anî ziman: "Tê bîra min dema ez 25 salî bûm, dewleta Tirk sûcên herî qirêj weke serjêkirinê dikir û wêneyên wê dikişandin. DAIŞ`ê jî niha heman rêbazî bikar tîne".

**ÇIMA JIN?**

Zelûx Ebdo rêber Abdullah Ocalan wekî "Pêxemberê ku ronahî jê dibare" pênase kir û got, her çiqasî bixebitin nikarin mafê rêbertî bidin û wiha pêde çû: "Em ê şopdarên rêya wî bin û wesiyetên wî bi cih bînin heta ku em azadiya wî ya fîzîkî bidest bixin û Efrîn û hemû herêmên dagirkirî rizgar bikin".
Zelûx Ebod anî ziman ku rêber Abdullah Ocalan taybetmendî û girîngiyeke mezin daye jinê, ji ber ew ya ku zêdetir zerarê ji ber siyasetên binpêkirinê yên dewletên serdest dibîne û bi vê yekê gotina rêbertî "Jin çavkaniya jiyanê ye" bi bîr xist
Welatiya bi navê Fikret Mihemed di civînekê de ku di sala 1997`an de li herêma Suryan a nû ya Helebê lidar xist rêber Abdullah Ocalan dît. Li gorî Fikret Mihemed, armanc ji lidarxistina wê civînê ku nêrînên gel derbarê rewşa rêbertî de nas bikin, moralan bidin wî û Tevgera Azadiya Kurdistanê, nas bikin.
Fikret Mihemed destnîşan kir ku rêbertî çîroka xwe ji wan re vegot. Bûyerên ku di dema ragihandina şoreşê de pêk hatin bi bîr xist, hezkirin û destekdayîna gel girt û wiha axivî: "Ji zarokatiya xwe ve aşiqê welat bû, dixwest ku hezkirina welat bi havalên xwe bide nasîn."

**'WELATÊ KU WELATÎ TÊ DE NE KOLE BE'**

Di wê civînê de nîqaş di navbera beşdaran de hate kirin. Fikret Mihemed ji rêbertî xwest ku gotegotên dijberên Tevgera Azadiya Kurdistanê ku dibêjin tevger li dijî îslamê ye zelal bike.
Rêbertî wiha bersiv da: " Dema ez meleyê mizgeftê bûm min xwest ku maska li ser rûyê kesên ku banga Îslamê dikin û Qurana pîroz li gorî ajindeyên xwe bikar tînin, eşkere bikim. Ola Îslamê ji hovîtî û derewên wan dûr e. Ji ber Îslam banga wekhevî, edalet û hezkirinê dike."
Fikret Mihemed her wiha diyar kir ku rêbertî îşaret bi girîngiya avakirina welatekî ku kes têde azad be û bi aştî û aramî bijî ne koleyê dewletê be, kir.
Fikret Mihemed her wiha nerazîbûn nîşanî hewldanên dewletên komploger ên bi armanca çewisandina statuya Kurdî û nasnameya wê û wiha axivî: "Dewleta Tirk texmîn dike ku bi girtina rêbertî serî û laş ji hev qut kiriye û berxwedanê dê bidawî bike. Lê ew di vî alî de şaş e. Em ê bangên ji bo mafên xwe nerawestînin"

**'DIVÊ XEBAT RAST Û BAŞ BE'**

Her wiha welatiya bi navê Emîne Şêx ku sala 1995`an di civînekê li herêma Suryana nû ya bajarê Helebê de rêber Ocalan dît. Emîne Şêx destnîşan kir ku wê nizanîbû ku rêbertî dê beşdarî civînê bibe, lê dema ku rêbertî dît nikaribû kêfxweşiya bîne ziman.
Emîna Şêx got, di civînê de beşdarekî hevalê xwe rexne kir, rêbertî bi vî awayî bersiva wî da: "Armanc ne tenê xebat e. Tevahî cîhan dixebite. Divê xebat rast û baş be da ku encamên baş jê were girtin"
Amîna Şêx cesaret û heybeta rêber diyar kir û wiha got: "Dema me rêbertî dît, hestên me yên kêfxweşiyê gur bûn. Ew tişteke weke xewnekê bû."
Di wê civînê de rêber Abdullah Ocalan nasnameya dewleta Tirk ku bi kuştin, komkujî û qirkirinên li dijî gel û neteweyan tê naskirin eşkere kir û wiha digot: "Di serdema Osmanî de komkujî li dijî Kurdan hate kirin. Dewleta Tirk vê senaryoyê careke din dûbare dike."
Emîne Şêx wiha dawî li axaftina xwe anî: "Dixwazin bi girtina rêberê me me tune bikin. Lê em teslîm nebûne û nabin. Ji ber ku rêbertî bingehek ava kir ku heger hezar sal jî derbas bibin nayê hilweşandin û ji ber em wesiyetên wî dişopînin. Kesê ku hêz daye me tu hêz li cîhanê nikare wê bişkîne"
***ANHA***

# Kampanya "Navê min navê dayîka min e"

**Kampanyeya "Navê min navê dayîka min e" ya sala 2018'an hatî despêkirin û niha ji aliyê rêxistina gel û geşepêdanan ve bi xebatên nû tê mezinkirin heta niha ji aliyê 27 parlementer û kesayetên naskirî ve hatiye imzekirin.**

Kampanya "Navê min navê dayika min e" 5'ê Kanuna sala 2018'an hatiye destpêkirin. Di kampanyayê de welatî daxwaza bi cihkirina zagona nîştîmanî ya hejmara 3 ya sala 2016'an dike. Armanca vê kampanyayê qeydkirina navê zarokan bi navê dayikê ye. Li gor zagona Îraqê zarok tenê bi navê bavê xwe tên qeyîdkirin û nasîn. Ger bavê zarokekê ne diyar jî be bi navê bavê xwe yê ne diyar tê qeydkirin. Li ser vê mijarê Rêxistina Xelk û Geşepêdanan a Başûrê Kurdistanê xebatek daye despêkirin û çarçoveya xebatên xwe yên kampanyayê li ser tura xwe ya civakî par kirin.
Di 3'ê Tebaxa 2014'an de çeteyên DAÎŞ êrişî Şengalê kirin, zêdeyî 6 hezar jin û zarok hatin revandin û heta niha jî sê hezar ne diyar in. Jinên ji ber destdirêjiyê dû canî bûne û zarokên wana ji çeteyên DAÎŞ'ê ne nikarin zarokên xwe ser navê xwe qeyîd bikin. Zagona rizgarbûna jinên Êzidî 1'ê Adara 2021'an ji aliyê Encûmena Nuneran a Îraqê ve hate erêkirin û tê de tu rêyên ji bo yekalîkirina rewşa wan zarokan nînbû. Ji ber wê jî heta niha 4 hezar zarok bê nasname ne û ji ber nebûna nasnameyê ji mafê xwendinê bê par mane.
Li Şengalê xebat tê meşandin ku civaka Êzidî wan zarokan qebûl bikin û bejdarî nava civakê bibin. Heta niha projeya zagonek ji bo vê rewşê bê derxistin ji aliyê 27 perlementeran ve hatiye îmzakirin û di nava wan de Serokê Encûmena Nunerên Îraqê, Rêxistina Xelk û Geşepêdan, Rêxistina Netewê Yekgirtî, hunermend, zanîngeh û kesayetên Êzidî jî beşdarbûna ji bo zêdetir kampanya mezin bikin û bigihînin raya giştî.
***JINHA***





# Li Silêmaniyê pêşangeha çîrokên şer hat vekirin

**Pêşangeha hunerî ya Beyan Caf ku çîrokên şer bi şêwazên cuda yên hunerî li hev anîne ji aliyê welatiyên Silêmaniyê ve rastî eleqeyeke mezin tê.**

Pêşangeha bi navê "Çima Şer" ku ji aliyê hunermend Beyan Caf ve li navenda Vîm a Silêmaniyê hatî vekirin dê heta 28'ê Sibatê vekirî be. Çîrokên şer ên di pêşangehê de cîh girtine bi şêwaz û hunerek cûda hatine li hev anîn û têde behsa karesatên şer ên giringî pê nehatine dayîn dike. Di pêşangehê de zêdeyî 10 tabloyên bi şêwazên cûda hatine nîşandan, gelek ji wan bi hunera 'maskin tîb' hatine hatine amadekirin. Her karek hunerî çîrokek taybet û navek xwe heye, ji bo amadekirina berhemmek wisan jî demek jêre pêwîste.



Xwendevana koleja hunera ciwanekan a Zanîngeha Silêmanî Tablo Loqman serdana pêşangehê kir û wiha behsa hunerên hatine nîşandan dike: "Dema mirov navê pêşangehê di bihîse mirov dibêje ku di hemû wêneyan de wê xwîn, tundîtujî û şer hebe, lê belê çîrokên vê pêşangehê bi şêweyek cûda hatiye bi berhevkirin, ev jî bala hemû temaşevanan dikêşe."
***JINHA***



# Jiyan Tekçe: Erbane dengê jinê ye

**Jiyan Tekçe diyar kir ku Erbane li dijî civaka baviksalar nîşana serhildana jinê ye, qîrîna ji bo aştiyê ye û got, erbane li xaka kevnar ya Mezopotamyayê dengê jinê ye.**

Li xaka kevnar a Mezopotamyayê, Erbane weke dengê pîroz ê bi hezarê salan ê jinê tê naskirin.
Ji Sumeran heta bi vê serdemê amûreke 5 hezar salî ya Mezopotamyayê ye. Yek ji wan amûran e ku gelek çand û bawerî xwe pê îfade dikin.
Ereb û Fars jê re dibêjin "Def", Kurd jî jê re dibêjin "Erbane".
Erbane bi sedan sal in di her qada jiyanê de cihê xwe heye. Li dawetan, sersaxiyan, mewlûdan, weke dengekî rûhanî hatiye pênasekirin.

**ERBANE Û JIN YEKPARE NE**

Li vê xakê Erebane û jin yekpare ne. Bi hesret, bi eşq, bi êş û rondikên çavan herdu pîrozmendî digihêjin hev. Her tim bûye dengê azadiyê yê jinê ku bi civaka baviksalariyê li malê hatin asê kirin û hatin qetilkirin.

**Ev amûra ku bi cewhera jinê hatiye afirandin ne bi melodiyê, lê bi rîtmê tê lêdan.**

Du cûreyên erbaneyê hene; yek jê bi çermê sexte, ye jî bi çermê rastî hatiye çêkirin. Ya ku bi çermê rastî hatiye çêkirin li gorî germahiya qadê dikare sist bibe yan jî hişk bibe. Erbaneya ku bi çermê rastî hatiye çêkirin, destpêkê li ser tîna agir tê germkirin û bi vî rengî ji bikaranînê re tê amadekirin. Li aliyê hundirîn ê erbaneyê jî xelek hatine bicihkirin. Erbane li cihekî nêzî sîngê tê bilindkirin û destek li jêrê, yê din jî li nava wê, tê lêxistin. Xelekên ku ew dorpêç kirine jî bi kilkirina wan li çerm dikevin û rîtmê çêdikin.

**Erbane bi destên hunerî yên jinan digihêje nifşên nû.**

Mamosteya Erbaneyê Jiyan Tekçe anî ziman ku Erbane bi taybetî ji aliyê çandî ve temsîla jinê dike û got, "Erbane xîtabî her kesî dike, lê ji bo jinê hîn taybet e. Dengê qîrîn, xemgînî û kêfxweşiya jinê ye. Jin bi Erbaneyê dikare hestê xwe nîşan bide. Jinên ku li Erbaneyê dixin li nava civakê cihê hurmetê ne. Jinan Erbane afirandin, ji ber ku herî baş wan jiyana xwe nîşan dan. Di her rîtma Erbaneyê de danheviya bi hezaran salan heye. Li vê xaka ku êş qet lê kêm nebûye, dengê jinê bi Erbaneyê bilind dibe. Erbane qîrîna jinê, aştiyê ye. Ji ber vê yekê cihê Erbaneyê ji bo civaka Kurd cuda ye. Heta jin hebe, Erbane jî wê hebe."
***ANF***



## Zimanê dîlgirtî; kurdî

Rauf Karakoçan



Di wan demên dawîn de li Tirkiyê li ser qebûlkirina zimanê kurdî wek dersa hilbijartî nîqaşek heye. Hin qebûl dikin, hin jî qebûl nakin. Yên herî zêde diparêzin jî çapemaniya Başûr û hin derdorên nîjadperestên kevneperest in.
Ev nîqaşên li ser zimanekî dîlgirtî çi qasî bi kêrhatî ne, wateya wan çi ye, divê çawa bên xwendin? Ji bo ku em bala xwe bidin nîqaşên li ser zimanê dayikê, divê em di serî de lê pênaseya ziman binêrin.
Ziman sedemeke hebûna civakê ye. Hêmana herî girîng e ku çandê diguherîne an jî îfade dike. Rêber Abdullah Ocalan di parêznameyên xwe de li ser zimanê kurdî îzahatan dike.
Serok Apo dibêje "Ziman bi xwe berhevbûna civakî ya zîhniyet, exlaq û hestên estetîk û fikrî ye, nasname û hebûna wate û hestê ye ku hatiye hişmedkirin."
Êrişên li ser zimanê kurdî îsbat dikin ku li ser gelê Kurd mêtingerî heye. Qedexekirina ziman û çandê ji ber qirkirina gel e. Bi van qedexeyan hewl didin bi salan civakê asîmîle bikin, di nava neteweya serdest de bihelînin û bê nasname bihêlin. Qada ku mêtingerî herî zêde lê bi bandor e û herî zêde lê tê birêxistinkirin, qada ziman û çandê ye. Zimanê neteweya serdest ku zimanê fermî yê dewletê ye, dixin nava hemû qadên jiyanê. Hemû navên ku bi zimanên zikmakî ne, tên guherandin. Di hemû qadên jiyanê de xwe îfadekirin tê astengkirin. Avabûna civakeke nexweş encama qedexe û asîmîlekirina ziman û çandê ye.
Dûrketina ji zimanê dayikê, li dibistanan dest pê dike. Li sûkê, li daîreyên dewletê, li qadên jiyana rojane dewam dike û heta dikeve nava malan jî. Niha li malan jî hema bêje zimanê dayikê namîne. Di encama polîtîkayên asîmîlasyonê yên dewleta mêtinger de gel ji zimanê xwe yê resen tê dûrxistin. Êdî dor tê heta otoasîmîlasyonê.
Otoasîmîlasyon; bi zanebûn an jî nezanî dûrketina şexs, pêkhate an jî gelekî ji zimanê xwe ye. Xwe li ber asîmîlasyonê bê parastin dihêle. Rê li ber xweînkarê vedike. Mirov çima ji zimanê xwe yê dayikê dûr dikeve û ferzkirinên pergala serwer, mêtingeriyê qebûl dike? Çima, bi zanebûn an na, mirov di nava sîstema dewleta mêtinger de dihele û dibe mîna dijminê xwe? Çima ziman-çanda dewleta kolonyalîst qebûl dike û dibe yek ji wan, dibe xerîbê ziman û çanda xwe? Otoasîmîlasyon bêyî fêhmkirina vê rewşê, nikare were îzahkirin.
Ew qas êriş li ser ziman û çanda tên kirin ku hema bêje tu jîngeh jê re namîne. Mîna ku îro li Kurdan dikin. Strangotina li kolanan jî qedexe ye, dibe sedema girtinê. Axaftina bi zimanê dayikê, jiyandina çanda xwe wek 'paşverûtî' tê qebûlkirin. Mirovên ku xwe jê xelas nekin, berê xwe bidin ziman û çanda neteweya serdest, pi bi hêsanî asîmîle dibin. Di encamê de xwe înkar dikin û jiyana wan ber bi xiyanetê ve diçe.
Zimanê dayikê mafekî xwezayî ye. Qedexekirin, astengkirin û tunehesibandina wî, rêbazek e ku dewletên mêtinger gelek caran bi kar tînin. Asîmîlasyon bi cudakirin, marjînalkirin, ziman û çandê dest pê dike. Şêweyekî komkujiyê ye ku wek qirkirineke spî tê pênasekirin ku civakek ji zimanê xwe yê dayikê bê dûrxistin.
Wateyeke din a ziman; berhevbûna zîhniyet, raman, nirxên exlaqî û hestyarî ye û qedexekirina ziman mehrûmkirina ji van nirxan e.
Heta ku ev neyên dîtin ne mimkun e ku encamên kêrhatî ji nîqaşên 'dersên hilbijartî' derkevin. Gotineke pêşiyan heye; "Aş çûye, li pey çekçeqokê ketiye." Ji bo kesên ku dersên hilbijartî diparêzin, ev bersiva herî baş e.
Polîtîkayên dewletên mêtinger, dîzaynên avakirina netewedewletan in. Neteweperestî çavkaniya zîhniyeta yekparêz e. Çawa ku rayedarên dewleta Tirk gelek caran bi bîr dixin; yek dewlet, yek milet, yek welat û yek al e. Bi komkujîyan jî asîmîlekirina hemû cudahiyan digihêje armanca xwe. Ya ku li Kurdistanê hate kirin û li ser gelê Kurd hate ferzkirin, ev e. Divê 'dersa hilbijartî' jî wek yek ji van ferzkirinan bê dîtin. Heta ku ev zîhniyet neguhere, zextên li ser zimanê dayikê û çandê dê dewam bikin.
Gelo dewleta mêtinger ku zimanê kurdî qedexe dike, çima dixwaze kurdî wek dersa hilbijartî were hînkirin an jî derseke wiha dê çi feydeyê bide Kurdan?
Ziman asta pêşketina civakê nîşan dide. Bi qedexeyên li ser zimanê dayikê û çandê re civak tê astengkirin. Mêtingeriyê nehişt ku civak geş bibe û nahêle bijî jî. Ev rewşeke têkildarî hebûna civakê ye. Divê em qedexeya li ser çand û ziman û polîtîkayên asîmîlasyonê di vê çarçoveyê de bibînin.
Kî hesta dayikeke ku bi tirkî nizane, lê neçar dimîne di girtîgehê de ji zarokê xwe re bêje 'Kamber Ateş, nasilsin? (Kamber Ateş, tu çawa yî?) fêm dike? Dersa hilbijartî ya dewleta Tirk ku zilmeke ew qasî mezin kiriye, ne lutfek e. Daxwaza vê jî qebûlkirina kolonyalîzmê ye. Astengkirina kurdî nayê qebûlkirin. Jixwe nebûna perwerde û hîndekariya bi zimanê dayikê sedema sereke ya pirsgirêka neteweyî ya Kurd e. Ev înkarkirina gelekî ye.
Naskirina ziman û çandê di heman demê de tê wateya naskirina Kurdan. Her çend rewşa Iraq û Îranê bi qismî cuda be jî, di encamê de hebûna pirsgirêkên li hemû parçeyan mîna hev e. Pirsgirêka Kurd pirsgirêka neteweya mêtingehkirî ye. Heke dewletên kolonyalîst dê pirsgirêka kurd çareser bikin, divê dawî qedexekirina zimanê kurdî û esareta çandî bînin.
Dersa hilbijartî ji bo Kurdan nîqaşeke paşdemayî ye. Mafê gelê Kurd heye ku zimanê xwe bê sînor, bê astengî bi kar bîne û fêr bibe. Divê tu carî neyê qebûlkirin ku dersa hilbijartî ya neaqilane têr were dîtin. Neteweperestiya kevneperest a Kurdan xwedî li wê derdikeve û sedema wê jî ew e ku li ber polîtîkayên dewleta Tirk amade ye. Meseleya berjewendiyan e.
Zimanê kurdî ew qas kevnar e ku nabe bibe dersa hilbijartî. Têkoşîna li qada ziman û çandê di heman demê de têkoşîna hebûnê ye. Gelê Kurd tu carî nikare dest ji vê têkoşînê berde. Divê ev yek di Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê de bersiva herî watedar a li hemberî dijmin be. Divê her Kurdek bizane ku bi qasî şîrê spî yê dayika me helal e û hîn bibe, bixwîne, binivîsîne, di perwerde û hîndekariyê de bi kar bîne. Parastina zimanê xwe yê dayikê divê wek qadeke herî bingehîn a têkoşîna azadiyê bê dîtin.
***ANHA***

# Ji ber bihabûna venêrîna bijîşkan çûna dermanxaneyan zêde bûye

**Ji ber bihabûna venêrîna bijîşkan, herwiha ji ber ku piraniya xelkên herêmê aboriya wan lawaz e, gelek jê dema nexweş dikevin nikarin biçin bijîşk. Ji ber wê neçar dibin bê venêrîna bijîşk diçin dermanxaneyan û bi dermanan tedawiya xwe dikin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Li bakur û rojhilatê Sûriyê li gorî aboriya gel venêrîna bijîşkan pir biha ye. Herwih cudayî di navbera bihayê venêrîna bijîşkan de jî heye. Gelek kes rewşa wan ya madî pir lawaz e. Ji ber wê dema nexweş dikevin li şûna ku li ser nexweşiyê bifkirin li ser pereyên tedawiyê difkirin. Gelek jê bê venêrîn dermanan dikirin û tedawiya xwe dikin. Dibe ku ew derman ji wan re ne baş be jî, lê ji neçarî dikin. Ev dibe sedem ku nexweşiya wan girantir bibe, yan jî nexşiyeke din derkeve. Derbarê



mijarê de hin welatiyên Qamişlo nêrînên xwe ji me re anîn ziman.



**`Bihabûna venêrîna bijîşkan ji me re dibe astengî`**

Welatiya bi navê Şikriya Ehmed li ser bihabûna venêrîna bijîşkan wiha axivî: "Venêrîna bijîşkan pir biha



ye. Derfeta me nîne em biçin bijîşk. Berî demekê ez nexweş ketim min nikarî biçim bijîşk, min hin derman ji dermanxaneyê standin, lê wî dermanî zirar li tenduristiya min kir û nexweşiyeke din çêbû. Li şûna ku xwe tedawî bikim bi nexweşiyeke din ketim. Em hêvî dikin ku rêveberiya tenduristiyê li ser bihayê venêrîna bijîşkan bisekine, çimkî gelê herêma me piraniya wan xizan in."

Welatiyê bi navê Ebas Şêro jî li ser heman mijarê wiha axivî: "Ji ber ku venêrîna bijîşkan biha ye, gel êdî ditirse nexweş bikeve. Her bijîşk li gorî xwesteka xwe bihayê venêrînê distîne. Hin jê venêrîna wan bi 8 hezarî ye ya hina jê 20 e. Derfeta me nîne em bi 20 hezaran bidin. Çimkî ji bilî venêrînê em dermanan jî dikirin. Em ji sibehan heta êvaran kar dikin heta ku pêdiviyên malê pêk tînin. Rojbiroj jiyan li me teng dibe. Piraniya nexweşiyên çêdibin sedema dayîna demamên bê venêrîna bijîşkan e."

**`Kesên nikarin biçin bijîşk, dikarin werin Klînîkên Gel tedawiya xwe bibînin`**

Welatiya bi navê Tadî Mehmûd ku li Klînîkên Gelek tedawiya xwe dibîne wiha axivî: "Heta niha gelek kes Klînîkên Gel nas nakin. Klînîkên Gel projeyeke baş e û barê xizanan sivik dike. Çimkî gelek welatî pere bi wan re nînin ku biçin gel bijîşkan. Li klînîkan biha kêm e û alîkariya feqîran tê kirin. Herwiha derman, wêne, test û teşxîskirin bi nîvê bihayê derve ye. Li derve venêrîn zêdeyî deh hezarî ye li vir



bi sê hezaran e."

Tadî da zanîn ku li Klînîkên Gel danûstandina bijîşkan bi nexweşan re pir baş e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em li vir bi rehetî tedawiya xwe dibînin. Tevayiya bijîşk û karmendên li vir bi me re alîkar in. Ji dema ku Kilînîk hatin vekirin ez têm li vir tedawiya xwe dibînim. Kesên ku nikarin biçin bijîşkan, dikarin werin Klînîkên Gel tedawiya xwe bi pereyên kêm bibînin."

Klînîkên Gel alîkariya xizanan dikin û heta asteke baş barê wan sivik dikin. Ev Klînîkên ku ji aliyê Saziyên Civaka Sivîl yên Herêma Cizîrê ve hatin vekirin, cara yekê ye ku nexweşên xizan derman dikin.

Li Klînîkên Gel 57 bijîşkên pispor hene. 13 beşên tedawîkirinê jî weke, Kilînîka



neurolojî, hestî, diran, jin û zarokan û hwd. Hene. Herwiha beşa tehlîla xwînê, îko, dermanxane, fîlm û beşa hewarî jî heye.

Berdevka Klînîkên Gel Rewda Simaîl bîr xist ku Klînîkên Gel projeyeke civakî ye û ji bo alîkariya civakê ji milê tenduristî ve kar û xebatê dike û ev li axaftina xwe zêde kir: "Klînîk ji saet 8`ê sibehan heta 2`yê nîvro vekirî ne. Gelek bijîşkên bajarê Qamişlo bi me re alîkar in. Venêrîn bi sê hezarî ye, kesên ku di saziyên Rêveberiya Xweser de kar dikin venêrîna wan bi 2500 lîreyî ye. Wêneyê



îko bi nîvê bihayê derve ye, tehlîl 25% tê qutkirin û yê dermanan jî 10% ye. Hin caran jî kesê ku pir xizan be em rewşa wî dişopînin û pereyan jê nastînin."

Rewda got, Klînîkên Gel ji bo xizmeta Gelê herêmê hatiye vekirin. Deriyê me ji her kesî re vekirî ye em her nexweşî qebûl dikin. Kesê xizan li şûna ku dermanên bê venîrîna bijîşk bi kar bîne, dikare li vir venêrîna xwe bibîne û dermanan jî bi bihayê kêm bigire.

**`Bikaranîna dermanan bê erêkirina bijîşk rêbazeke pir şaş e`**

Bijîjka zarokan ya bi nav Meryem Ehmed li ser dayîna dermanan bê erêkirina bijîşk wiha got: "Vê demê nexweşî zêde bûye û venêrîna bijîkan jî bih ye. Ji ber wê piraniya welatiyan berê xwe didin dermanxaneyan. Eger tenduristiya wan baş nebe çareke din diçin dermanên girantir dikirin. Ev rêbaz pir şaş e. Çimkî bê erêkirina bijîşk nabe derman were bikaranîn. Li



şûna ku pereyên venêrînê li ser xwe sivik bikin nexweşiya xwe mezintir dikin. Çimkî mirov bi serê xwe dermaman bixwe zirar li tenduristiya wî dike û bi demê re hêza laşê mirov kêm dibe. Divê bê erêkirina bijîşkan derman neyên bikaranîn."



**Em li gorî rewşa nexweş dermanan didin**

Li ser dayîna dermanan bê erêkirina bijîşkan dermanfiroş Riyad Mûsilî got, jimareke zêde ji welatiyan berê xwe didin dermanxaneyan. Bi teybetî vê demê çûna dermanxaneyan ji ya bijîşkan zêdetir bûye. Dema ku nexweş tê gel me em zû bi zû derman nadinê. Destpêkê rewşa tenduristiya wî nas dikin û li gorî rewşê dermanan didinê. Kesê ku nexweşiyên wan sivik bin û ti nexweşiyên weke dil û şekir bi wan re tinebin em derman didinê. Lê kesê ku nexweşiya wan giran be em wan rêdikin gel bijîşk û ti dermanan nadinê. Rast e venêrîn biha ye lê hin caran mirov neçar e ku biçe xwe venêrîn bike. Em jî wek dermanfiroş li gorî derfetên heyî bi welatiyan re dibin alîkar. Em bi hêvî ne ku aloziya aborî li hermên me çareser bibe, da ku welatî karibin bi rehetî bijîn û neçarî rê û rêbazên şaş yên ku zirar li tenduristiyan dike nebin.

Hevserokê Yekîtiya Bijîşkan ya herêma Cizîrê Ehmed Yûsif jî wiha got: "Wekheviya bihayê venêrîna bijîşkan ji aliyê Desteya Tenduristiyê ve tê dayîn. Wek Yekîtiya Bijîşkan em jî her tim hewldanên xwe dikin ku ji welatiyan re bibin alîkar. Ji bo wê jî dema dawî bi hevkariya TEV-DEM`ê me kilînîkên gel vekirin. Tê de nexweş bi bihayekî pir kêm tê tedawîkirin. Divê kilînîkên taybet jî bi pereyên zêde kar nekin û tîkîliyên wan bi nexweş re ne li ser bingehê madiyetê be."

Ehmed Yûsif bal kişand ser newekheviya bihayê venêrîna bijîşkan û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Tedawiya her bijîşkî bi rengekî cuda ye. Hin jê yên çava, dil, hestî, venêrîna hundir, diran, jin û hin yên zarokan in. Venêrîna her beşê ji ya din cudatir e, ji ber wê bihayê wan jî ji hev cuda ye."

Gîgira Hevseroka Desteya Tenduristiyê ya Herêma Cizîrê Bêrîvan Derwêş diyar kir ku ji bo wekheviya bihayê venêrîna bijîşkan li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê nîqaş tên kirin û ev li axaftina xwe zêde kir: "Em hewl didin ku di demeke nêz de wekheviyê bixin nava tevayiya venêrînan û bihayekî li gorî pisporiya her bijîşkî hilbijêrin. Lê heta niha ne diyar e ka wê wekhevî di kîjan astê de be. Wê biryar ji hêla Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ve were dayîn. Em jî wek Desteya Tenduristiyê ya Herêma Cizîrê emê di dayîna biryarê de ji gelê xwe re alîkar bin."





# 2 şehîdên Pêngava Gurzê Gelan li Dêrikê hatin veşartin

**Bi hezaran şêniyên navçeya Dêrikê cenazeyên 2 şervanên QSD'ê Xebat Marînos û Serhed Harûn ku di Pêngava Gurzê Gelan de li bajarê Hesekê şehîd bûbûn, li Goristana Şehîd Xebat spartin axê.**

Bi hezaran şêniyên navçeya Dêrikê ya kantona Qamişloyê ji bo wergirtina cenazeyên şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Xebat Marînos (Xebat Orhan) û Serhed Harûn (Arsîn Şahîn) ên ku di Pêngava Gurzê Gelan de şehîd bûbûn, li ber nexweşxaneya Dêrikê kom bûn.

Piştî wergirtina cenazeyên her du şehîdan, şênî ber bi Goristana Şehîd Xebat Dêrik ve bi rê ketin.

Li goristanê ji fermandarên QSD'ê Muhyedîn Xêrkî şehîdên azadiyê bi bîr anîn û bal kişand ser girîngiya mezinkirina têkoşînê û şopandina rêya şehîdan heta pêkanîna serkeftinê.

Cenazeyên her du şehîdan li Goristana Şehîd Xebat hatin veşartin.

***ANHA***



# Dewleta tirkî ya dagîrker li Werxelê çekên Kîmiyayî bi kar anîn

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Belge û dîmenên berxwedana li Warxelê û sûcên şer yên leşkerên dewleta tirkî ya dagîrker kirîn hatin weşandin. Ji wan belgeyan eşkere dibe ku artêşa Tirkiyê li Warxelê çekên Kîmiyayî bi kar anîne.**

Li Qada Berxwedanê ya Werxelê, gerîlayên HPG û YJA Starê ji 7`ê Hezîrana 2021`ê dest pê kir û çar mehan bênavber li ber xwe dan. Belge û dîmenên her kêliya vê berxwedanê û sûcên şer ên ku leşkerên Tirkiyê ên dagîrker kirine, eşkere dibin.

Artêşa Tirkiyê ya dagîrker bi taybetî di destpêka meha Tebaxê de gazên kîmiyayî li tunelên şer ên Werxelê gelekî bi kar anî. Ji bo tunelan hilweşînin jî gelek caran teqînên mezin li tunelan kirin. Gerîlayên ku 12`ê Tebaxê ji tunelên şer ên Werxelê derketin derve û xwe berdan nava leşkerên Tirkiyê, 2`ê leşker kuştin. Leşkerên Tirkiyê ku dîtin gerîla bi wêrekiyeke mezin ji tunelan derdikevin û bi ser wan ve tên, ketin nava panîkê, alavên xwe yên leşkerî li pey xwe hiştin û neçar man birevin.



Berxwedêrên Werxelê li vê derê nêzî 200 kîlo teqemenî bi dest xistin û xistin nava tunelan. Gerîlayan dîmenê van teqemeniyan kişandin û teqemeniyên ku gazên bi jehr belav dikin ên li dijî tunelên şer hatin bikaranîn, bi belge kirin.

Ji fermandarên berxwedana Werxelê Mahîr Kop ji kameraya gerîla re axivî û got, wan ewqas alavên leşkerî ji ser leşkeran rakirin û xistin tunelên şer, lê dijmin pê nehesiya.

Di nava alavên leşkerî de yên gerîlayan ji ser leşkerên Tirkiyê ên dagîrker rakirin, tevî teqemeniya TNT, bombeyên destan û teqemeniyên bi tîpa C3, her wiha tetrîtol (tetrytol) jî tê dîtin.

Li gorî agahiyên li ser Wikipedia'yê hatine weşandin, teqemeniya Tetrîtol ji tevlîhevkirina teqemeniyên tetrîl û TNT'ê pêk tê. Mîna ku çekên kîmiyayî (mînak; gaza sinir di qalikên fîşekên çekê de tê bikaranîn) li tupên teqemeniyê têne bikaranîn.

Tê gotin ku tetrîl (C7H5HNO8) ya herî bi jehr û teqîner e, lewma li nexwezayê zû winda dibe.

Bandora tetrîlê ya li ser tenduristiya mirovan baş nehatibe lêkolîn jî li gorî epîdemiyolojîk li ser çermê mirovan gelekî bi bandor e. Dike ku çerm biweşe, bixure, bihele. Di heman demê de bandorê li kezebê jî dike.

# Şêniyên Qamişlo şehîd Cûdî Firat spartin axê

**Şêniyên Qamişlo cenazeyê şervanê QSD'ê Azad Arîs (Cûdî Firat) li Goristana Şehîd Delîl Sarûxan bi merasimeke girseyî spartin axê.**

Şervanê QSD'ê Azad Aris (Cûdî Firat) 13'ê Sibatê di encama bersivdayîna êrişên dewleta Tirkan dagirker ên li ser Eyn Îsayê de şehîd bû.

Bi sedan şêniyên kantona Qamişlo, tevî endamên saziyên sivîl, rêxistinên jinan û partiyên siyasî cenazeyê şehîd Cûdî Firat bi merasîmekî bi heybet li goristana Şehîd Delîl Sarûxan spartin axê.

Merasîm bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir, dûvre li ser navê Meclisa Malbatên Şehîdan a Qamişlo endamê meclisê Kêfo Osman axivî û tevahî şehîdên azadiyê bi bîr anîn û sersaxiya malbata şehîd Cûdî Firat û gelê Bakur û Rojhilata Sûriyê xwest û wiha got: "Şehîd Cûdî şehîdê sêyemîn ê malbatê yê û bi destpêkirina çirûska şoreşê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tev li



hêzên leşkerî bû."

Kêfo kompoloya navneteweyî ya li ser rêber Abdullah Ocalan şermezar kir û wiha domand: "Tu hêz nikare me ji fikirê rêber Ocalan û Tevgera Azadiya Kurdistanê bi dûr bixe, em ê heta dawiyê piştgiriya berxwedana li çiyayên Kurdistanê bikin."

Kêfo da zanîn ku Tevgera Azadiya Kurdistanê ji tevahî cîhanê re îsbat kir ku aştiya li Rojhilata Navîn di çareserkirina doza Kurd de ye û wiha dawî li gotina xwe anî: "Şervanên Kurd di oxira parastina mirovahiyê ji tevahî şêweyên terorîstê de canê xwe da. Em soz didin em ê rêça şehîdan heta serkeftinê bimeşînin."

Li aliyekî din jî, enddamê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Seîd Sîpan anî ziman ku şehîdan bi fedekariya xwe careke din Kurdistan kir yek û wiha got: "Em îro şehîdên xwe di dilên xwe de oxir dikin. Cîhan bi tevahî destanên dîrokî li ser şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê dinivîsin. Bi berxwedana şervn û fedekariya şehîdên me, em ê azadî, edalet û wekheviyên li Rojhilata Navîn pêk bînin."

Sîpan got, serhildana Bakur û Rojhilatê Sûriyê bersiva tevahî plan û siyasetên dewletên komploger e.

Her wiha dayika şehîd Cûdî Firat bi rêya telefonê berxwedana gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê silav kir û ev tişt got: "Ez bi şehadeta zarokên xwe serbilind im, Cûdî zarokê we tevan e. Rêya wan, rêya şeref û rûmetê ye û em ê heta dawî li ser rêça wan bin."

Dûvre, wesîqeya şehîd Cûdî Firatê hate xwendin û radestî Meclisa Malbatên Şehîdan hate kirin û cenaze li Goristana Delîl Sarûxan hate oxirkirin.

***ANHA***

# QSD`ê Nasnameyên 3`ê şehîdan eşkere kirin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**



**QSD`ê nasnameyên 3 şervanên ku 2 ji wan di bersivdayîna êrişên dewleta Tirkiyê ya dagîrker de yên li ser Eyn Îsayê de û yek ji wan ji ber nexweşiyê Şehîd bûn, eşkere kirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li ser malpera xwe ya fermî bi daxuyaniyekê navên 3`ê şehîdan ragihandin. Herwiha di daxuyaniyê de soza pêkanîna armancên şehîdan hate dayîn.

Daxuyaniya wiha ye:

Bi dagîrkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji aliyê dewleta Tirkiyê ya dagîrker û çeteyên wê ve, her çi qas ji aliyê hêzên garantoran ve sînorek ji bo dewleta Tirkiyê ya dagîrker hatibe dayîn jî lê li tevahî bakur û rojhilatê Sûrîyê bûye hedefa dagîrkeran û êrişên bêsînor ên hewayî û bejahî pêk tên. Dewleta Tirkiyê ya dagîrker dema van êrişan pêk tîne ji bêdengîya hêzên navnetewiyê sûdêwerdigre ango hêzên garantor çavên xwe ji van êrişan digrin û dibin ker û lal.

Yek ji van êrişan jî roja 13`ê Sibatê artêşa Tirkiyî ya dagîrker û çeteyên wê bi obûs û hawanan êriş birin li ser xalên hêzên me ên li Eyn Îsayê. Di encama van topbaranê de 2 hevrêyên me gihîştin asta şehadetê. Herweha, hevrêyê me Serhed Harûn ku ev demeke dirêje bi nexweşiyekê giran re têdikoşiya tevî hemû hewildanan jî roja 8'ê Sibatê tevlî karwanên nemiran bû. Hevrêyê me Botan ji bajarê Kobanê ye û ji şerê destpêkê ên 2013`an ve tevli têkoşîna azadiyê bûye. Di şerê Kobanê û li herêmên din li dijî şerê DAIŞ'ê de cîhê xwe digre. Hevrêyê me Cûdî û Serhed di demên cûda tevli têkoşîna me ya azadîyê bûne. Her du heval jî li dijî DAIŞ`ê şerê bêhempa meşandine û di têkçûna DAIŞ`ê de para wan heye. Di pêngavên dîrokî yên Kobanê, rizgarkirina Girê Spî, Minbic, Hol, Dêrazor û Reqayê têkoşiyane û erk û peywirên dikevin li ser milan wan bêkêmasî pêk anîne. Her sê hevrêyên me jî şer û jiyana xwe kirine yekpare û ji bo azadîya gelê xwe û herêmê berpirsyartiyên xwe yên şoreşgerî, welatparêzî û mirovatîyê heya kêliya dawî ya jiyana xwe bi pîvan tevgerîyane. Em di şexsê hevrêyên xwe Botan, Cûdî û Serhed de hemû şehîdên xwe yên nemir bi minet û bi rêzdarî bi bîr tînin û sersaxiyê ji her sê malbatên şehîdên xwe û gelê xwe yê berxwedêr re dixwazin. Em careke din soz didin ku wê ti xeyal û hêviyên gel û şehîdan nîvço nemîne û ji bo temamkirina wan em ê heta dawiyê têkoşînek bêhempa bimeşînin.

Nasnameyên pakrewanan wiha ye:

Nasnav: Botan Bexdik
Nav û Paşnav: Mihyedîn Ehmed
Navê dayik: Cemîle
Navê bav: Hecî
Cihê ji Dayikbûnê: Kobanê
Cih û dîroka şehadetê: Eyn Îsa 13'ê Sibata 2022`an

Nasnav: Cûdî Firat
Nav û Paşnav: Azad Aris
Navê dayik: Aysel
Navê bav: Ebdulah
Cih û dîroka şehadetê: Eyn Îsa 13'ê Sibata 2022`an

Nasnav: Serhed Harûn
Nav û Paşnav: Ersîn Şahîn
Navê dayik: Xatûn
Navê bav: Qasim
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 8`ê Sibata 2022`an."

# Tecrîdkirina Rêber APO tecrîdkirina mirovayiyê ye

Ezher Ehmed: Hêzên desthilatdar û komploger, ji ber ku li hemberî berxwedan û têkoşîna Rêber APO bin ketin, bihêrs in û rêbertiya me di nava tecrîdeke giran de digirin.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**



Hêzên kapîtalîst û desthilatdar yên komploger, bi plangeriyeke navneteweyî Rêberê Gelê Kurd Rêber APO, dîl girtin. Ev komplo di şexsê Rêber APO de, li ser gelê Kurd û gelên Rojhilata Navî bi peyman û hewldana planên nû yên qirêj dewam dike. Hêzên kapîtalîst, bi armanca tinekirina nirxên civaka azad, wekhev û jiholêrakirina Modernîteya Demokratîk, komplo pêş xistin. Rêber APO, bi pêşxistina berxwedana dîrokî, bi heqîqeta avakirina civaka azad rastiya komplogeran pûç kir. Hêzên komploger, ji ber ku li hemberî berxwedan û têkoşîna mezin ya Rêber APO, bin ketine, bihêrs in û îro Rêber APO di nava tecrîdeke giran de digirin. Têkîldarê mijarê Rêveberê Yekîtiya Roşenbîrên Herêma Cizîrê –ofîsa Hesekê Ezher Ehmed ji me re axivî. Ehmed diyar kir ku dewleta tirkî li Îmralî li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi konsepta şer re tecrîdeke girankirî pêk tîne û wiha got: "Felsefeya Rêber Apo ji seranserê cîhanê re bûye felsefeya çareseriya pirsgirêkên ku li Rojhilata Navî bûne girêk. Ji bo vê yekê em wek gelê rojavayê Kurdistanê dibînin ku projeya çareseriyê ya Rêber Apo, li hemberî sîstema sermayedariyê alternatîf e. Ev felsefe û fikrê azad ku ji aliyê Rêber Apo ve tên dayîn li ser berjewendiyên van sîsteman xeterê çêdike. Ji bo vê yekê eger em sedemên tecrîda ku niha li ser Rêber Apo tê meşandin bipirsin, bêguman ev ji hev ne qut in."

**'Em hêza xwe ji projeya Xweseriya Demokratîk digirin'**

Ehmed bal kişand ser bêdengiya cîhanê ya li hemberî tecrîda girankirî û axaftina xwe wiha domand: "Di dîrokê de kesên ku fikrê wan xeterê li ser sîstemên desthilatdar çêdike, ew tenê tên girtin û bi cezayê giran tên cezakirin. Ji bo vê yekê li ser Rêber Apo tecrîd tê meşandin. Di demekê de ku aloziyeke bi vî rengî li cîhanê heye û gelên cîhanê li çareseriyê digerin, Rêber Apo berî niha bi demeke dirêj şêwazê çareseriya pirsgirêkan danîbû holê. Bi taybetî ji bo Rojhilata Navî felsefe û rêya jiyana nû ka wê çawa be, piştî sedê salan ji jiyana tarî pêşkêş kiribû. Ev projeya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye dayîn, mînaka wê projeya Rêveberiya Xweser ya li bakur û rojhilatê Sûriyê tê dîtin û li seranserê cîhanê deng vedaye. Lê Tirkiye û hêzên desthilatdar dizanin ku ev proje li ser wan xeterê çêdike. Ji ber wê tecrîdek girankirî xistine dewrê."

**'Tecrîdê di nava tecrîdê de pêk tînin'**

Ehmed bal kişand ser kiryarên dewleta tirkî û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî ji demên borî û heta niha bi kiryarên xwe yên faşîzan rêgezên mirovayiyê li ber çavên her kesî binpê dike. Tecrîda ku li ser Rêber Apo dide meşandin, li ti deverên cîhanê nehatiye kirin. Piştî vê jî di nava tecrîdê de tecrîdeke din pêk tîne. Em wek gelê rojavayê Kurdistanê di gelek mijaran de deyndarên Rêber Apo ne."

**'Divê em li xwediyê felsefeya çareseriyê xwedî derkevin'**

Ehmed projeya Netweya Demokratîk wek çareseriya pirsgirêk û qeyrana cîhanê dît û wiha nirxand: "Projeya Rêber APO ya Neteweya Demokratîk, gav bi gav di şoreşa rojavayê Kurdistanê de pêk tê. Ev jî bi xwe re projeya sîstemên sermayedar bin dixe. Ji bo azadiya Rêber Apo divê her kes xwe berpirsyar bibîne. Rêber Apo ne kesayeteke ji rêzê ye. Ew xwediyê nirx û felsefeyekê ye. Eger em bixwazin ji vê qeyrana heyî derkevin divê em li xwediyê felsefeya çareseriya vê qeyranê xwedî derkevin."

**'Divê li hemberî tecrîdê asta nîşandayîna bertekan bilindtir bibe**

Rêveberê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê-Ofîsa Hesekê Ezher Emed wiha dawî li axaftina xwe anî: "Li bakurê Kurdistanê jî berxwedana li hemberî dewleta tirkî tê kirin, êdî hişmendiya dewletneteweyê dihejîne. Wekî ku li rojavayê Kurdistanê projeya çareseriyê ji felsefeya Rêber Apo hat girtin, di heman demê de Bakur jî îlhama xwe ji projeya Rojava girtiye. Ji ber vê yekê çareseriya pirsgirêka li Tirkiyê û Kurdistanê heyî, azadiya Rêber Apo ye. Eger ev nebe her ku biçe wê pirsgirêk kûrtir bibe. Li rojavayê Kurdistanê ev têkoşîn jî li ber çavan e, li vir gel rêveberî û sîstema xwe ava dikin. Êdî ev model her ku diçe pirtir tê naskirin û erêkirin. Ji bo ku ev qeyrana li seranserê cîhanê derdikeve ji holê were rakirin, çareseriya wê proje û felsefeya Rêber Apo ye. Divê em hemû li xwediyê vê projeyê xwedî derkevin û berî ku ev qeyran mezintir bibe em daxwaziya azadiya wî bikin."

# Fikir û felsefeya Rêber Apo Komplo bêbandor kir

**Jiyan Ebas-Qamişlo**

**Ebdulkirîm Sarûxan: "Armanca wan ji Komploya Navneteweyî misogerkirina tinekirina gelê Kurd û têkbirina tevgera azadiya kurdistanê bû, lê bi ser neketin."**

Ji bo agirê aloziya cîhanî û herêmî mezintir bikin û êrişa qirkirina Kurd dewam bike, Hêzên hegemon yên xwediyên projeya `Rojhilata Navî ya nû` ji bo herêmê ji nû ve li gorî berjewendiyên xwe parçe bikin û nexşeyên nû xêz bikin, hebûna Rêber Ocalan li hemberî projeyên xwe asteng dibînin. Ji ber wê Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan 15`ê Sibata 1999`an bi komployeke navneteweyî ravandin û li Tirkiyê li girava Îmralî dîl girtin. Derbarê mijarê de endamê Kongera Islama Demokratîk Ebdulkirîm Sarûxan diyar kir ku armanca wan tinekirina gelê Kurd mîsoger bikin û tevgera azadiya kurdistanê têk bibin, lê bi ser neketin.



Sarûxan da zanîn ku armanca komployê pêşîgirtina li têkoşîna azadiya gelê Kurd bû. Herwiha teqez kir ku tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo û êrişên dewleta tirkî yên qirkirina Kurdan dewama komploya 15'ê Sibatê ye û axaftina xwe wiha domand: "Encama komployê tersî planên hêzên hegemon derket, nikarîbûn rê li pêşiya fikrê Rêber Apo bigirin û têkoşîna azadiya gelên bindest xurttir bû. Dewletên dagîrker ev ji bo planên xwe yên li ser gelan wek metirsiyeke mezin dîtin. Ji ber wê dewleta tirkî ya dagîrker, di şexsê Rêber Ocalan de pêvajoya her cure êrişên qirkirinê yên li ser gelê Kurd dan destpêkirin."

Sarûxan herwiha diyar kir ku projeyên sîstema kapîtalîst û dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî civakên Rojhilata Navî heta roja îro didomin û ev nirxandin kir: "Rêjima Tirkiyê her bi xewn û xeyalên ku dewleta Osmanî ji nû ve ava bike dijî. Jixwe ev proje bi alîkariya hêzên hegemon tê plankirin. Ji bo wê, planên qirêj bi tinekirin û bişaftina civakan, herwiha xurtkirina nijadperstiyê tên kirin."

Têkoşîna Îmralî bû çirûskek nû ya azadiyê

Sarûxan da zanîn ku destpêka sala 1990`î deweta tirkî, bi çekên kîmyayî êrişî çiyayên azad kir. Armanc jê qirkirina tevgera azadiya Kurdistanê bû. Lê bi berxwedana gerîlayên azadiyê tevgera azadiyê bihêztir bû. Ji bo wê dewletên ku şerê demokrasiyê dikin, biryara girtina Rêbertiyê dan. Lewra digotin, eger Ocalan were girtin, wê tevgera azadiyê jî tine bibe. Ne gelê Kurd tenê tevayiya gelên azadîxwez li dijî komployê nerazîbûna xwe nîşan dan. Lewra tevgera azadiya Kurdistanê parastina tevayiya mafê mirovên bindest dike."



Ebdulkirîm Sarûxan bal kişand ser têkbirina armanca komployê û got, Rêbertî wek fizîkî hatiye girtin, lewra em li ser fikir û felsefeya wî dijîn û wiha axaftina xwe domand: "Berxwedana Rêber APO ya li zindana Îmralî ev peyam da: `Hêzên nevneteweyî nikarin bi girtina min fikir û felsefeya min tine bikin`. Têkoşîna Îmralî bû çirûskeke nû ya azadiyê, lewra di her hevdîtina bi Serokatiyê re nûbûnek bi xwe re dianî."

Ebdulkirîm Sarûxan di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Niha gelê Kurd di qonaxeke nû ya dîrokî re derbas dibe. Ev qonax encex bi ramanên Rêberê Gela Abdullah Ocalan, bi ser bikeve. Banga min ji gelê Kurdistanê re ew e ku, ji bo azadiya Rêbertiyê têkoşîna xwe xurttir bike û bi berxwedana xwe armancên dijmin têk bibe. Bila sala 2022yan sala azadiya Rêber APO û berxwedêrên di zindanê de be."



## Med Tv û Zimanê Kurdî

**Faruk Sakik**

Piştî ku Med Tv hat vekirin, rojek ji dostên Kurdan kesek Alman hatibû serdana Tv û gotibû; "Ji bo me Almanan Martin Luther çi be, ji bo Kurdan jî Med Tv ew e. Zimanê Almanî ji gelek devokên cuda bu û jihevfêmkirina li hin herêman zehmet bû. Martîn Luther Încîl bi zimanê Almanî çap kir û belav kir. Piştî vê xebatê standarta zimanê Almanî saz bû. Zimanê kurdî jî ji bo ku bi asîmîlasyonê rûbirû mabû û devok û lehçeyên cuda hebûn jihevfêmkirin pir zehmet bû. Lê bi vekirina Med Tv standartek çêbû. Îroj Kurd hemû bi vê yekê wê ji hev fêm bikin"

Med Tv weşana yekê ya dîtbarî bû ku zimanê kurdî jê bilind dibû.

Televizyona kurdî û ya Kurdan ya yekê navê xwe ji yekem şaristaniya Kurdan ji Medan girtibû. Med-TV 2500 sal piştî xerabûna şaristaniya Medan dest bi weşana xwe kiribû.

Di vê pêvajoya dîrokî de ji bo Kurdan pirr tişt neguherîbû. Kurdistan her di bin dagirê de û Kurd her nav têkoşîna netewî de bûn. Zimanê wan qedexebû, navê welatê wan tune bû, serek û pêşengên wan an li zindanan, an li çiyayan an jî li sirgûnan bûn.

Med-TV wek rihekî biefsûn li ser xaka Mezopotamya geriya, çand, folklor, ziman, adet, tore, muzîk, stran, çîrok û xeyalên însanên van zewiyên xemgîn careke din vejand. Zimanê Kurdî tevî çar zaravayên xwe her şev ji ekranên televîzyonan ber bi hesret û xeyalên Kurdan ê hezaran salî herikî.

Med TV wek dibistaneke bû. Kurd yekem car bi saya vê televîzyonê bi dewlemendî û kûrahiyên nirxên xwe yên netewî hisiyan.

Bi taybetî di nav Kurdan de hêsta netewebûnê piştî weşanên Med TV bi awayekî liberçav pêşket. Kurd bi hevdu hisîyan, welatê xwe nas kirin, bi dîroka xwe derxistin, bi hêza xwe hisiyan.

Med TV ziman û çanda wana qedexekirî û veşartî li wan vegerand. Ji hişyarbûna wan a sedan salan re alîkarî kir.

Lê ya esas xebatên ji bo parastin û pêşvexistina zimanê kurdî bû. Di destpêka weşana Med Tv de, li Kurdistan gelek kesan ji zimanê weşanê fahm nedikir. Lê gelek kedkar û pirsporên ziman, di Tv de li ser ziman xebat meşandin da ku ji çar aliyê Kurdistan ji aliyê hemû kurdan ve ev ziman were fahmkirin. Bi demê re ev yek jî pêkhat. Hêdî hêdî fahmkirina ziman de pêşketin çêbûn.

Êdî di nav civaka Kurdan de, di dewsa selamunelêykum de 'rojbaş', di dewsa teşekur dikim de 'spas', dewsa sihhet de 'tenduristî' hat bikaranîn. Hêdî hêdî ew peyvên zimanên dagirkeran ku di nav axaftina rojane de cîh girtibûn dihatin rakirin. Piştî demek, roj hat axaftina bi zimanê dijminên Kurdistan wek eybek dihat dîtin. Her çiqas kovar û rojnameyên bi kurdî hebûn jî lê ji bo di nav kurdan de xwendin û nivîsandin kêm bû zêde bandore xwe tunebû. Med Tv ev valahî bi bernameyên xwe yên ziman û bi weşana xwe tijî kir.

Îroj ji bo li Tirkiyê zimanê kurdî li dibistana bibe dersa bijarte nîqaşek destpêkirî. Dîsa hin kes dibêjin tevgera azadî çima piştgirî nade vê kampanyayê.

1- Di destpêkê de daxwaza tevgera azadiyê zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê. Û gotin bilî vê hedefê, hedefên biçûk ji desthilatdara dibe xizmet.

2- Med Tv li ser daxwaza Rêber Apo hat avakirin. Û di van xebatên Med Tv yên ziman de keda tevgera azadiya Kurdistan û Rêber Apo dive neyê jibîrkirin.



# Xweparstina Cewherî li hemberî terora dewletê ye

Selah Şêxmûs: Hişmendiyeke xweparastinê ya xwe dispêre Neteweya Demokrtîk li bakur û rojhilatê Sûrî ava bûye. Wê bi nûjenbûna xwe li hemberî terora dewleta tirkî ya dagîrker, bibe çeka serkeftina gelan ya mayînde.

**Serbest Etê/Qamişlo**

Her zindî ji bo domandina jiyana xwe, bi mercên jiyanî yên xwexwedîkirin, pirkirin û xweparastinê tev digere. Ji ber wê xweparastin zagoneke xwezayî ya jiyanê ye û li cem tevayiya zindiyan heye. Mirov jî di na de, her zindî xwediyê mekanîzmayeke xweparastinê ye. Rêber Apo di nava van her sê mercan de, xweparastinê mercê herî girîng dinirxîne.

**Derketina desthilatê û pêşketina terora dewletê li ser civakê**

Li gorî dîrokê, piştî derketina fêlbaziya mêr ya desthilatar, pergala jinê di nava civakê de helweşiya û hevsengiya civakê rabû. Bi sîstema nû ya mêrê desthiltdar, serdestî û bindestî, kole û koledar, mafdar û mafxwer çêbûn. Ji wê demê ve, li şûna amûrên jinê yên afirandina jiyanê, amûrên şer pêş ketin. Li hemberî civakan jî êriş, talan û zordestiyê dest pê kir. Vê pergala desthildar roja me ya îro bi rengê dewletê teşe girt û artêşên mezin ji bo parastina berjwendî û desthilata dewletan ava kirin. Van dewletan, amûr û tekînkên şer rojbiroj xistin dewrê û êrişên qirkirinê li hemberî civaka dan despêkirin. Gelê Kurd jî bi hezarên salan e li hemberî êrişên qirkirinê li ber xwe dide. Lê li gorî tê payîn, ev qirkirin û terora dewletî sedsala 20`an û 21ê bi êrişên dewleta tirkî



ya dagîrker yên ser çar parçeyên Kurdistanê û Kurdên li her cihê cîhanê, bi erêkirineke navneteweyî tên kirin.

**`Civakbûn û xweparstina rewa helwesteke dîrokî ya gelan e`**

Têkildarî xweparstina rewa endamê rêveberiya Akademiyên Civaka Demokratîk yên bakur û rojhilatê Sûriyê Selah Şêxmûs ji me re axivî. Şêxmûs da zanin ku helwesta xweparastina dîrokî ya mirovan li hemberî xetera tinebûnê, civakbûn bû û ev nirxandin kir: "Girêdana bi çand, hûner û zanistê (tecrûbe) ve, civakan xwe diparast. Li ser vî bingehî, xweparastina herî biencam ku gel û civakan xwe ji qirkirinê rizgar kirîn, xweparastina çandî ye. Dema em dibêjin xweparstina çandî, ne parastina ziman û wêjeyê tenê ye. Xweparstina çandî, şêwazên birêxistina civakê, pergala rêvebirin û avkirina mêjiyekî hevapar, giştî di nava civakê de dihewîne. Gelek gel û civak yên li Mezoptamyayê jiyane û împartoriyên herî bihêz ava kirine. Lê ji ber xweneparistênekê bihêz û domdar, ji aliyên hêzên desthilatdar ve hatine bişaftin û qir bûne; mîna Aşûrî, Kildanî, Laz, Akadan û hwd. din".

**`Hişmendiya xweparastinê ya gel çeka serkeftinê ye`**

Şêxmûs herwisa bal kişand ser pergala Xweparastina Rewa ya gelan di dema niha de û axaftina xwe wiha domand: "Li bakur û rohilatê Sûriyê, gel di binê sîwana pergala Neteweya Demokartîk de, bi wekheviya di navbera jin û mêr; di navbera tevayiya gelan de- pergala xwe ya parastinê ava kirin û ta astekê xwe diparêzin. Ev pergal ne leşkerî tenê ye, hişmendiya civakî ya xweparstina rewa ye û di her milê jiyanê de ava bûye. Gel û Rêveberî di nava hewldana pêşxistina şêwazên vê xweparastinê de ne. Jixwe ev jî mîrasa PKK`ê û şoreşa rojavayê Kurdistanê ye. Lewra bi bingehekî hizrî, çandî û wijdanî Tevgea Azadiya Gelan dest pê kir û li hemberî evqas êriş, li ber xwe da û xwe parast. Me dît bi êrişên DAIŞ`ê delwetên xwedîhêz û xwedîartêşên mezin çawa hatin helweşandin, lê gelê Kurd bi hêza xwe ya cewherî ku bê artêş bû, DAIŞ şkand. Herwiha tevî dewamkirina êrişên dijwar yên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê, şerê taybet yê bi orgenîzekirin û serkêşiya dewletan yên li hemberî vê pergalê, pergala xweparstinê ya gelên herêmê, xwe xurttir û bihêztir kir."

**Bi sîstema Neteweya Demokartîk gel parastina xwe ya cewherî nûjen dike û serkeftinê mayînde dike`**

Rêbveberê Akademiyên Civaka Demokratîk yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, serkeftinên QSD, YPJ-YPG`ê bi bîr xistin û axaftina xwe wiha qedand: "QSD`ê bi şahidiya tevayiya cîhanê serkeftinên dîrokî tomar kirin. Lê ya hêz û wateyê dide van serkeftinan, ew e ku xwe dispêre îdeolojiya Neteweya Demokratîk ya ku gelên herêmê pejirandine. Bi saya hizir û felsefeya Rêber Apo ev pergal hat avakirin û xwe nûjen dike. Li hemberî vê hêza ku ji aliyê gel bixwe ve hatiye avakirin, ti hêz nikarin bişkînin. Herî dawî mirov dikare serkeftina li hemberî êriş û plana li ser girtîgeha Xiwêranê ya Hesekê wek belge bide diyarkirin. Me dît ku bi hevgirtin û yekîtiya gelan dikarin êrişan bişkînin û serkeftinê misoger bikin. Teqez bi rêxistinbûna gelan wê êrişên dewleta tirkî ya dagîrker jî bi tevayî bên şkandin û serkeftina gelan wê mayînde be."

# Parastina ziman xwdîderketina li keda dayîkê ye

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

**Rewşenbîr, nivîskar û hunermendên Kurd her tim di berhemên xwe de girîngiyê didin zimanê dayîkê. Lewra ziman hebûna gelan e.**

Bi pêmana 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê, mamosteyên zimanê kurdî yên bajarê Qamişlo diyar kirin ku, eger civak zimanê xwe winda bike, wê ew jî winda bibe. Lewra ziman hebûna gelan e. Mamosteyan herwiha ev roj li tevayiya gelan pîroz kir, bi taybetî jî gelê Kurd.

**`Şoreşa Rojava zimanê kurdî ji qirkirinê parast`**

Mamoste Jiyan Mihemed got, divê em zimanê xwe pêş bixin û biparêzin. Jiyan Mihemed axaftina xwe wiha domand: "Bi saya şehîdan û nivîskarên me yên ku ji




bo parastana zimanê kurdî zehmetî kişandine, em gihiştin vê astê. Zimanê kurdî zimanekî resen û kevnar e, lê ji bo ku gelê Kurd were qirkirin, dijmin zimanê kurdî qedexe kir."

Mamoste Jiyan got, şoreşa Rojava zimanê kurdî ji qirkirinê parast, herwiha da zanîn ku, pirojeya Rêveberiy Xweser zimanê tevayiya gelên bakur û rojhilahtê Sûriyê, ji siyaseta hêzên desthilatdar parast û diparêze. Mamosta Jiyan wiha got: "Ji ber ku projeya Rêveberiya Xweser projeyeke demokratîk e, ji her alî ve êriş dikinê. Tişta herî girîn û pêwîst ew e ku em zimanê xwe û li xwîna şehîdên xwe xwedî derkevin. Lewra ji bo ziman, hebûn û çad û hunra civaka xwe, cane xwe feda kirin."

**`Tişta ku mirovan ji zindiyên din cuda dike ziman e`**

Herwiha mamoste Xaliya Ehmed jî got, tişta ku mirovan ji zindiyên din cuda dike ziman e, ji ber wê dema ku hêzên serdest dixwazin civakekê tine bikin, destpêkê zimanê wê qedexe dikin. Li ser girîngiya ziman, Xaliya wiha got: "Ji bo ku gelê Kurd were tinekirin, hêzên serdest bi sedê salan e, xwendina bi zimanê kurdî qedexe kirine. Lê bi fikir û felsefeya Rêber Apo û şoreşa Rojava zimanê me zindî bû."

Mamoste Xaliya Ehmed axaf-



tina xwe wiha qedand: "Piştî şoreşê mamosteyên me ji bo xwendekara fêrî zimanê kurdî bikin, ji aliyê rejima Sûriyê ve pir zehmetî dîtin. Herwiha salên destpêkê malbat û xwendekaran jî ne dixwestin fêr bibin. Lê niha sal bi sal jimara xwendekarên me zêde dibe. Ev tê wê wateyê ku civaka me gihişt wê baweriyê ku eger zimanê dayîkê winda bibe wê civak jî winda bibe. Hêviya me ewe ku, civaka me li ziman, çand û hunera xwe xwedî derkeve. Ta ku nifşên me yên nû, li her çar perçeyên Kurdistanê bi azadî zimanê dayîkê bixwînin û pêş bixin."



## Perwerde û Kesayet

**Beşîr Taha Silêman**

Di mijara perwerdeyê de, avakirina kesayetê, di asta yekê de wek bingeh tê dîtin. Bi rêya avakirina kesayetê ji hêla perwerde, zanist û wijdan ve civakeke zana û hevgirtî tê avakirin. Civakên herî pêşketî, encama sîstemên perwerdeyên herî baş in. Mînak: Fîlenda, Vênziwêla, Capon, Çîn… Ev sîstemên perwerdeyê û dewletên rabûrî weke nimûne û encama perwerdeya herî rast tên dîtin û weke rastkêşekê, sîstemên perwerdeyê li wan, tên pîvan. Li hemberî wê li Rojhilata Navî û bi taybetî li weletên dagîrker ên ku perwerdeyên xwe bi ser neteweyên din de disepînin, weke perwerdeyên qels û lawaz tên dîtin; hin xalên lawaziyên wê jî ev in:

a.Jiberkirin, li pêş e.
b.Ezmûn bingeh e.
c.Danheva pileyan merc e.
d.Perwerde, weke qadeke bazirganî tê dîtin.
e.Hêla pratîkî lawaz e.
f.Bawername bingeh e.

Tevî van lawaziyên berbiçav, ev sîstemên perwerdeyê bi ser neteweyên din de tên sepandin. Ev sepandin ziyaneke gelekî xurt digihîne bingehê avakirina kesayeta xwendekar. Wek mînak, ev xwendekarê ku li malê bi kurdî diaxive û hê ferhenga wî ya kurdî bi rengekî baş nepijiyaye, li dibistanê zimanê erebî, tirkî, farisî bi ser de tê sepandin. Ew di navbera fêrbûna zimanê nû û qezenckirina agahiyan de winda dibe. Tevî perwerdekarê ku bi gotineke kurdî di hundirê polê de naaxive, rewşê aloztir dike. Bi rengekî giştî ev yek di hundirê xwendekar de, hesnekirina dibistan û perwerdeyê ava dike. Kesyeteke dûrî çanda xwendin û lêkolînê tê avakirin. Tevî vê rewşê, ev perwerde heta refa nehan, wek perwerdeyeke neçar, tê sepandin. Ji ber vê yekê bi sedan xwendekar ji tevayiya neteweyan, bi rengekî nefermî ji dibistanê derdikevin û berê xwe didin, qadên din ( pîşesazî, avayîsazî, çotkarî, şivantî, …). Ji ber vê perwerdeyê, beşeke ji cavakê, nexweda tê dîtin û yê mayî di nava wê sîstemê de perwerdeya xwe berdewam dike. Ev beşa ku xwendina xwe berdewam dike bi ezmûnên refa nehan û bekeloryayê tê bêjingkirin. Bi sedan xwendekar ji ber pileyên kêm, ji dibistanê derdikevin û ew jî berên xwe didin cihên cuda (bazirganî, pîşe, kargeh…) Bi taybetî ezmûna refa bekeloryayê, dibe rêbendeke ku bi hezaran xwendekar ji ber pileyên kêm û rewşên cuda ji vê sîstemê der bikevin. Ev yek bandoreke gelekî neyînî li kesayeta xwendekar dike. Ev kesê ku bi salan xwendiye û ti pîşe ji xwe re negirtiye, ji nîşka ve xwe li qadeke vala dibîne. Neçar e, ew jî berê xwe bide cihên din û nefretê ji xwendinê bike. Herwiha kesayeta xwendekar di pêvajoya xwendinê de, rastî keysbaziya darayî tê û sîstema perwerdeyê bi diravan ve tê girêdan. Xwendekar di pêvajoya nehan û bekeloryayê de, rastî keysbaziyeke kirêt tê. Mamoste û xizim, xwendekar neçarî vekirina dewreyên branşan dikin. Ev yek xwendekar rastî keysbaziyeke darayî, dike. Herwiha bandorê li pêvajoya zaroktî û ciwaniya wî dike. Ji bo qezenckirina pileyên baş û bi destxistina beşeke qenc, bi şev û rojan divê bixwîne. Ev qonaxên ku ev kesayeta xwendekar di wan re derbas dibe, ziyaneke pir mezin li kesayeta vî xwedekarî dike û kesayeteke xwediya taybetiyên tevlihev derdixe holê:

g. Kesayetên nîvxwenda û di perwerdeyê de, bi binketine, ji civakê re, pêşkêş dike.
h.Kesayetên keysbaz bi hukmê perwerdeya ku tê re derbas bûne, diafirîne.
i.Hin kesayetên xwedîbawername, lê ne xwediyên zanist û perwerdeyê, tevlî qadên cuda yên zanistê dikin .
j.Kesayetên moralşkestî û ji xwendin û zanînê dûr dertîne.
k.Kesayetên di hizrên wan de zanist û perwerdeyê bi dirav û berjewendiyê girêdayî diafirîne.

Bi vê yekê û bi rêya van xwendekaran û kesên ku di vê perwerdeyê re derbas bûne, mirov nikare dabaşa avakirina civakeke pêşketî û zana, bike!